FAIRPLAYER Kooperativ

Dibistanên xurt
bê zordarî û bê tundî

## Em li hêviya hevkariya we ne!

## Beşdariya zarokên we ya lêkolîna zanistî, ya bi navê „Hevkarî+Lîstika Adil"

Dayik, bav û berpirsên perwerdeyê yên hêja,

Dibistana zaroka/ê we biryar daye ku beşdarî Projeya„Hevkarî+Lîstika Adil" (Fairplayer+Kooperativ) bibe. Ev proje ji bo piştgiriya avakirina têkiliyên baş li dibistanê û pêşiyê li zordariyê/tundiyê bigire tê birêvebirin. Projeya „Hevkarî+Lîstika Adil" di mijara zordariyê de li dibistanên li Westfaliya Bakur ya Renê (Nordrhein-Westfalen-NRW) hatine hilbijartin projeyeke ji bo lêkolînê ye.

Zordarî/şidet (tundî) dikare li herkesî bandorê bike û li her dibistanê pêk were. Hin caran fahmkirina hin kesan ku bi zordariyê re rûbirû dibin yan na, di cih de nayê zanîn. Lê dikare encamên zordariyê yên dijwar çêbibin û ew ji bo xwendekaran/şagirt (zarok) bibe barekî mezin û giran. Lewma jî divê bi awayekî lezgîn li hemberî zordariyê helwesta rast bê stendin û pêşî li zordariyê were girtin.

Niha li dibistana zarokên we bi vê projeyê ve girêdayî bi kêmanî li hemberî zordariyê bernameyek wê bê pêkanîn. Em dixwazin piştî vê pêkanînê binirxînin ku li dibistanê ji aliyê erênî de guhertinek çêbûye yan na. Ev xebat/lêkolîn ji aliyê koma Zanîngeha Brandenburgê ya Teknîkî Cottbus-Senftenberg, Zanîngeha Azad ya Berlinê û lêkolînerên Nexweşxaneya Zanîngeha Ulmê tê pêkanîn. Di çarçoweya projeyê de wê bê lêkolînkirin ku pêşiya zordarî çawa dikare bê girtin û dema zordarî pêk hat divê çi bên kirin.

**Pêdiviya me bi destûra we heye**

Ji bo ku em karibin bandora bernameyê/programê ya li ser zarokên we fahm bikin, em ji we tika/rica dikin ku ji bo alîkariya vê bernameyê hûn destûrê bidin ku zarokên we beşdarî/tevî van rapirsînan/anketan bibin.

Ji bo zarokên (xwendekar) pol/sinifên 7, 8 û 9 an di sê demên cuda de wê sê anket bên çêkirin.

Tarîx: Cotmeh / Mijdar 2025

Tarîx: Hezîran / Tîrmeh 2026

Tarîx: Kanûn 2026

**Rapirsîn (anket) giştî yanî anonîm e û wê li gorî rêzikên parastina daneyan/agahiyan bê çêkirin**

Ji kerema xwe forma razîbûnê tevî anketa yekemîn dagirin û bi zarokên xwe re bişînin dibistanê.

## Ewlehiya parastina daneyan

Parastina agahiyên zarokên we ji bo me gelekî giring e. Ji ber vê jî li gorî Rêziknameya Yekîtiya Awrûpa ya Parastina Agahiyan (GDPR/DSGVO) agahî pir bi dizî tên parastin û tenê ji bo armanca lêkolînê tên bikaranîn.

Xwendekar (zarok) di derheqê mijarên jêrîn de wê bersîvên pirsan bidin:

- Agahiyên kesane (Mînak: zayend keç/kur, temen/emir, ûwd.)
- Serpêhatiyên zordariyê
- Behremendî/qabîlîyetên hestyarî û civakî/sosyal
- Atmosfera polê/sinifê

Em dizanin ev mijar hesas in. Ji ber vê jî her zarokek wê navekî kod ya/yê, wê/wî hebe ku ew bi tenê bi vî navî bizanibe. Bi vê awayî wê neyê zanîn ku bersif yên kê ne, koma me ya lêkolînê jî wê bi van nizanibin.

Zarokên we kengî bixwazin, dikarin beşdariya xwe bi dawî bikin, ango betal bikin. Dîsa hûn dikarin hetanî meha Kanûn sala 2026 an agahiyan bidin pakijkirin. Piştî vê tarîxê hemû kod wê/dê bên pakijkirin.

Em ê bi piştgiriya we ya vê projeyê gelekî kêfxweş bibin.

**Heger pirsên we hebin?**

Em ê bi kêfxweşî bersif bidin. Ji me re E-Nameyekê bişînin:
fairplayer-kooperativ@b-tu.de

Ji niha ve gelekî spas!

Bi silavên ji dil

Koma me ya Fairplayer+Kooperativ

<u>Daxuyaniya destûrdayinê</u>

**Ji kerema xwe re vê daxuyaniyê bi almanî îmze bikin û bi zarokên xwe re bişînin dibistanê!**

Min /me nivîsa Zanîngeha Cottbus-Senftenberg BTU, Zanîngeha Azad ya Berlin (FU) û Nexweşxaneya Zanîngeha Ulmê (UKU) ya agahdariyê girt. Naveroka armancên xebatê, agahiyên çarçove û birêvebirina vê xebatê min/me xwend û min/me fahm kir.
Zaroka/ê (ên) min yên navên wê/wî (wan) li jêr in,

.....................................................................................

(Nav û paşnavê zarok)

Ez/em destûrê didin ku zarok/ên min/me tevî xebata bi navê “Fairplayer+Kooperativ” bibe/bibin.

.................................................................................

(Tarîxa îro û îmzaya we)

## Pênaseya Projeyê: “Hevkarî+Lîstika Adil” "Fairplayer+Kooperativ"

## Ev projeya li dijî zordariyê/tundiyê, çi ye û çawa tê pêkanîn?

## Armancên projeyê:

- Li dibistanê zarokên we kêmkirina zordariyê
- Başkirina têkiliyên di nava sinifê de

Dîsa lêkolîner wê bixwazin ku sedemên zordariyê derxin holê û bi perwerdeyeke diyar, hewl bidin ku di navbera mamoste û xwendekaran ji bo pêşîlêgirtina zordariyê fahm bikin û ji bo vê bibin alîkar. Ji bo vê armancê wê/dê mamoste bi bernameyên cuda perwerdeyê bibînin:

## Bernameya/programa Fairplayer ya rêber

- Armanc ji bo xurtkirina di hundirê sinifê de ya xwendekaran. Mamosteyên sinifê, hînî programê dibin û dawiyê di sinifê de pêk tînin. Xwendekar tên têgihandin ku zordarî çi ye û dikarin li hember wê çawa tevbigerin. Armac ew e ku zordarî qet dernekeve holê (pêşî lê bê girtin).

## Programa Hevkariya li dijî zordariyê (Mobbing)

- Ev program yekser ji bona mamosteyan e. Ev alîkariyê dike ku zordarî baştir bê zanîn û bi awayekî baş li hemberî wê bikaribe tekoşîn bê kirin.

## Hûrguliyên komên xebatê:

Mamoste dibin sê kom:

- **Kom 1:** Hem perwerdeya “Programa hevkariya dijî tundiyê (Kooperativ gegen Mobbing) û hem jî “Programa Fairplayer ya rêber” (Fairplayer.Manual) dibîne.
- **Kom 2:** Bi tenê perwerdeya “Programa Fairplayer ya rêber” (Fairplayer.Manual) dibîne.
- **Kom 3:** Perwerdeya “Programa Fairplayer ya rêber” (Fairplayer.Manual) dibîne, lê ev perwerde di sala 2026 an meha Kanûnê de piştî anketa sêyemîn tê çêkirin.

## Çima bi xwendekaran re anket tê çêkirin?

Ji bo danberheviya dema berî û piştî perwerdeyê de di sinifê de ku çi guhertin pêk tên, bên zanîn, ev anket tê çêkirin. Pirs li gorî serpêhatiyên zordariyê yên behremendiya hêstyarî ya atmosfera nava sinifê ne. Dîsa ji bo mijarên ku kî li zarokên we zordariyê dikin an jî kî li hemberî zordariyê derdikevin, tê nirxandin.

Ev pêvajo, giştî/anonîm e û li gorî hêmanên parastina daneyan/agahiyan tê birêvebirin. Ji ber ku bi kodkirinê tê pêkanîn, kesek nizane ku kê bersifa kîjan pirsê daye. Piştî xebat bi dawi bibe, kod tên rakirin û hemû agahî anonîm dibin.

**Tevlêbûn bi dilxwazî ye.** Lê erêkirina we, wê ji bo pêşketina programê dibe hevkarî û li dibistanê ji bo perwerdeyeke baştir alîkariyê dike. Ev ji bo ku zarok bi kêfxweşî werin dibistanê wê piştgiriyê bike.

## Ji bo agahdariyên zêdetir

Di derheqê projeya me de agahdariyên bi hûrgulî/berfirehtir, hûn dikarin di malpera me ya înternetê de bibînin. Bi koda çarqozî QR hûn dikarin pêywendiyê çêbikin.

www.fairplayer-kooperativ.de

## Têkilî

Heger pirsên we hebin, hûn dikarin bi e-nameyê, bi koma me ya projeyê re bikevin têkiliyê:
fairplayer-kooperativ@b-tu.de

## Kesên têkildar:

Berpirsyarên me yên projeyê ku hûn karibin, pê re têkevin têkiliyê ev in:

Helena Hotopp (M.Sc.)
Projektkoordination
(Kordînasyona Projeyê)
Freie Universität Berlin
(Zanîngeha Azad a Berlîn)

Tel.: 030 838 595 03

Felix Watzinger (M.Sc.)
Projektkoordination
(Kordînasyona Projeyê)
Brandenburgische Technische Universität
Cottbus-Senftenberg
(Zanîngeha Teknîkî ya Brandenburgische)

Tel.: 03573 85 744